# Lênihêrîna Kita'yê

## Zanyariyên têkildarî lênihêrîna bijîşkî li Navenda Miqatebûna Rojane ji Zarokan

Dêûbavên hêja, serperestên hêja,

Tenduristî ji bo mezinbûn û pêşketina zarokên me gellekî giring e. Xizmetên bijîşkî yên zarok û nûciwanan ji bo hemî zarokan di temenê derdora 4 salî da lênihêrîna bijîşkî ji bo têderxistina babetên xwarê raber dike:

- Gelo mezinbûna zarokê we baş e yan
- Gelo divê were dermankirin an bi awayekî taybet were piştgirîkirin.

Ji bo ku taybetmendiyên têkildarî tenduristiyê bi awayê pêşwext werin têderxistin, em ji we dixwazin ku derfeta lênihêrîna bijîşkî ji bo zarokê xwe dabîn bikin.

## Çi dihê lênihêrandin û miayînekirin?

Bijîşkên Xizmetên Bijîşkiya Zarok û Nûciwanan:

- Karînên zimanî û livdariyê yên zarokê we dipîvin û
- Pîvandineke bînahiyê û her wiha pîvandineke bihîstinê pêk tînin.

Eger pîvandina bihîstinê ne-asayî be, bijîşk rêka bihîstinê û perdeya guh dê seh bike. Lênihêrînên din ên bedenî tunene.

Her zarokek bi awayê cida dihê miayînekirin û lênihêrandin. Lênihêrîn derdora 20 deqeyî dem dibe.

Hûn ê encama lênihêrînê li pakêteke sergirtî wergirî. Encam bêyî destnîşankirina navî bo Rêveberiya Estatîstîkê ya Eyaleta Azad a Sachsen'ê ji bo nirxandina daneyên tenduristiyê dê were raberkirin.

## Çawa reamendiya ji bo lênihêrînê dihê raberkirin?

Beşdariya di lênihêrînê da:

- Dilxwazî,
- Beêaş e û
- Hewcedara rezamendiya we ya nivîskî ye.

Hûn bi îmzekirina di dawiya pirsnameyê da rezamendiya xwe ji bo lênihêrînê raber dikin. Her wiha hûn dikarin pirs an têbîniyên xwe binivîsin. Zanyariyên we dikevin bin pêwîstmendiya razdariya bijîşkî.

Pirsname ji aliyê Navenda Miqatebûna Rojane ji Zarokan (Kita) va radestî we tê kirin an dikrin wê ji malpera me daxînin û çap bikin: → dresden.de/kitauntersuchung

## Lênihêrîn liku û kengî pêk tê?

Lênihêrîn li Navenda Miqatebûna Rojane ji Zarokan a we pêk tê. Kadroya Navenda Miqatebûna Rojane ji Zarokan haya wan ji roja lênihêrînê heye yan ev trîx di pirsnameyê da hatiye destnîşankirin.

Pêwîst nake hûn ji bo lênihêrînê hevrê digel zarok bên. Helbet xuya ye ku hûn dikarin li gorî daxwaza xwe beşdar bibin.

Eger hûn bixwazin, fêrkarekî Navenda Miqatebûna Rojane ji Zarokan dikare hevrêtiya zarokê we ji bo lênihêrînê bike.
Di vê rewşê da, divê di dawiya pirsnameyê da "erê" nîşandar bikî.

## Çi belge divê ji bo lênihêrînê hebin?

Ji kerema xwe di roja lênihêrînê da belgeyên xwarê li pakêteke sergirtî radestî Navenda Miqatebûna Rojane ji Zarokan bikin:

- Pirsnameya dagirtî û îmzekirî
- Karta Vaksînasyonê (tenê ji bo şêwirînê)
- Eger hebin: Lênûska lênihêrînên pêşîlêgirtinê
- Eger hebe: Belgeyên bijîşkî (wek mînak nameyên bijîşk, raporên terapiyê)

Eger hûn pêşniyaza me ji bo lênihêrîna bijîşkî ya zarokê xwe bipejirînin, em ê pê kêfxweş bibin.

Têkildarî pirsan dikarî di rewşa daxwazê da serdana me bikin, digel me pêwendî çê bikin an nameyê bişînin – Xizmetên Bijîşka Zarok û Nûciwanên we.

## Têkilî

Landeshauptstadt Dresden
Amt für Gesundheit und Prävention
Kinder- und Jugendärztlicher Dienst
Dürerstraße 88, 01307 Dresden

Telefon: (03 51) 4 88 82 41
E-Mail: gesundheitsamt-kjg@dresden.de
→ dresden.de/kitauntersuchung
→ dresden.de/kindergesundheit

Weşîner: Landeshauptstadt Dresden, Amt für Gesundheit und Prävention, Amt für Presse-, Öffentlichkeitsarbeit und Protokoll, Gulana 2024an